Dinləyin, ay ellər, vətəndən deyim,
Söhbət – bizim kənddə, söz – bizim kənddə.
Sərindir baharı, payızda, qışda
İsti paltar geyib döz bizim kənddə.

Elə ki, yetişdi bahar çağları,
Əcəb dadlı olur meyvə bağları.
Cənnəti-məkandır uca dağları,
Minib kəhər ata, gəz bizim kənddə.

Külək əsən vaxtı çıxanda yala,
Az qalır, kürkünü çiyindən ala.
Güvən polad qollu igid Hilala,
Düşmənin başını əz bizim kənddə.

Kişi ağsaqqaldır, qadın ağbirçək,
Gəlinlər qəşəngdir, qızları göyçək.
Yazda çəmənlərdən dərib gül-çiçək,
Nazlı yar döşünə düz bizim kənddə.

Harda gecələdin, orda soraq sal,
Birinə dost deyib evlərində qal.
Ucalmış dağların ay şahı qartal,
Göylərdə dövr edib süz bizim kənddə.

Götür, kərəntinin yaxşısını seç,
Düşək yoncalığa, mənle biçin biç,
Ay Qarabağ qızı, buz bulaqdan iç,
Yaqut dodaqları büz bizim kənddə.

Fikirilər içində bir xeyli çalxan,
Qələmi qılıncdır, dəftəri qalxan,
Şairdir Məzahir, Zöhrab, Edilxan,
Bu cür ustadlardan yaz bizim kənddə.

Zövq alıram Ədalətin səmindən,
Bülbülü çıxarar dar qəfəsindən.
Umbayın yanıqlı zümzüməsindən
Coşub dilə gələr saz bizim kənddə.

Biclik bilmir, heç kimsəni küyləmir,
Namərd oxu kimi sinə teyləmir,
Namussuz olanı qəbul eyləmir,
Qeyrətliyə salıb iz bizim kənddə.

Yasirəm, söz qoşum qoy ömür boyu,
Necə də şən keçir bayramı, toyu,
Təmizdir havası, sərindir suyu,
Onunçün saf olduq biz bizim kənddə.
15.09.1990

Serok Barzanî têkildarî Kerkûkê: Dê berdêlên giran ên rijandina xwîna zarokên me hebin

Serok Mesûd Barzanî derbarê xwepêşandanên Kerkûkê got: "Dê berdêlên giran ên rijandina xwîna



zarokên me hebin."

Li parêzgeha Kerkûkê ya Başûrê Kurdistanê Kurdan li dijî girtina rêyên bajêr xwepêşandanek li dar xist.

Di xwepêşandanên Kurdan de kesek hat kuştin û 8 kes jî birîndar bûn.

"Rewşeke gelekî metirsîdar li Kerkûkê çêkirine"

Serok Mesûd Barzanî derbarê rewşa wî bajarê Başûrê Kurdistanê

de daxuyanî da û got: "Ev çend roj in, li Kerkûkê hinek alî, vekirina baregeha Partiya

Demokrata Kurdistanê (PDK) asteng dîkin û rêya di navbera Hewlêr û Kerkûkê girtine û nahêlin welatî jiyana xwe ya asayî û çûnûhatinê bidomînin. Wan rê nadin welatî jiyana xwe ya asayî bijîn û rewşeke gelekî nebaş û metirsîdar ji bo xelkê Kerkûkê çêkirine."

"Ev hewldanek e ji bo derxistina fitneyê"

Serok Barzanî diyar kir ku wan

her tim xwestiye Kerkûk bibe mîna-ka pêkvejiyan, biratî û yekrêziya di navbera pêkhatiyên bajêr de û wiha pê de çû:

"Lê ev serederiya nebiçih û neyasayî, hewldanek ji bo derxistina fitne û têkdana pêkvejiyanê ye.

Cihê sosretê ye ku di çend rojên borî de hêzên ewlehiyê û polîsên Kerkûkê rê li ber alozî û kiryarên neyasayî yên astengkarên negirtine."

"xwîna ciwanên Kurd hat rijandin"

Serok Barzanî da zanîn ku hêzên Îraqê li Kerkûkê tundûtûjî li dijî xort û xwepêşanderên Kurdên Kerkûkê bikar tîne û xwîna ciwanên Kurd hat rijandin û got:

"Ev serederî nayê qebûlîkirin û dê encamên gelek xirab bi xwe re bîne, rijandina xwîna zarokên me li Kerkûkê dê berdêlên wê yên giran hebin."

Di dawiya peyama xwe de Serok Barzanî got: "Ez bang li Serokwezîrê Îraqa Federal dikim ku dawî li van astengî û aloziyan bîne û dawî li zilm, cudahî û astengiyan bîne. Ev ji ber ku rasterast pêkvejiyan û aramiya Kerkûk û navçeyên din dike armanc."

Nerina Azad

Salvegêra kuştina Jîna Emîniyê nêzik bû: Îranê zextên xwe zêde kirin



Çend roj berî salvegêra kuştina keça Kurd Jîna Emîniyê hêzên ewlehiyê yên Îranê xalê wê girt.

Tora Mafê Mirovan a Kurdistanê (KHRN) ragihand ku xalê Jîna Emîniyê, Sefa Elî li bajarê Seqizê yê Rojhilatê Kurdistanê hatiye girtin. Sefa Elî ji aliyê hêzên îstixbaratê yên Îranê (Îtlaat) ve hat girtin û wan ew ber bi cihekî nediyar ve bir.

Rêxistina Mafê Mirovan a Hengawê jî destnîşan kir ku hejmareke zêde ya hêzên ewlehiyê yên Îranê bi wesayîtan beşdarî girtina Sefa Eliyê 30 salî bûye.

Jîna Emîni 13ê Îlona 2022yan ji aliyê polîsên exlaqî yên Îranê ve "ji ber ku cil û bergên wê ne li gor yasayên Îranê ne" bi awayekî nere-

wa, hat desteserkirin.

Keça Kurd Jîna Emîni 16ê Îlona 2022yan 3 rojan piştî ku bi şkençeyê hat desteserkirin, canê xwe ji dest da.

Piştî ku Jîna Emîniyê canê xwe ji dest da, destpêkê li bajarê Rojhilatê Kurdistanê û piştê li Îranê bi hezaran kes derketine derve û bi dirûşmên "Jin, Jiyana, Azadî" Îran şermezar kirin.

Her ku desthilata Îranê zordestîya zêde dikir, xwepêşanderan jî bêhtir daxwaza azadiyê kir.

Xwepêşandanên li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê piştî demeke veguherî bangên ji bo hilweşandina rejîmê.

Jinên Kurd bûne pêşeng
Di xwepêşandanên de jinan bi raki-

rina desmalên xwe rola pêşeng lîst.

Li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê bi hezaran kes hatin girtin, bi sedan kes jî ji aliyê hêzên ewlehiyê yên Îranê ve hatin kuştin.

Bi sedan xwepêşanderên ku hatin girtin cezayê darvekirinê li wan hat birîn.

Îran hewl dide xwepêşandanên bitepisîne

Berîya hatina salvegêra kuştina Jînayê, desthilata Îranê hewl dide ku xwepêşandan û bîranînen ku ji nû ve dest pê dîkin bitepisîne.

Li gorî Hengawê, ji malbatên kesên ku di xwepêşandanên de hatine kuştin herî kêr 72 kes hatine girtin.

Zextên Îranê yên li ser malbatan jî zêde bûne.

Tora Mafê Mirovan a Kurdistanê (KHRN) anî ziman:

"Îranê ji bo ku merasîmên bîranîne li dar nexin gefê li malbatan dixwe."

Hengawê diyar kir ku bav û xwişka Mihemed Hesenzade yê ku di xwepêşandanên de hatibûn kuştin, hatin girtin.

Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan beriya salvegêra kuştina Jîna Emîniyê, tepeserkirin û "girtinên kêfî" yên Îranê şermezar kir.

Li aliyê din, partiyên Rojhilatê Kurdistanê jî ji bo salvegêra kuştina Jîna Emîniyê banga greva giştî kir.

Rûdaw

Serokwezîr Mesrûr Barzanî: Biryara îro ya Dadgeha Federalî pêkenok e

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê ragihand, biryara Dadgeha Federalî ya ragirtina biryara Serokwezîrê Iraqê ya radestkirina baregehên Par-



tiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li Kerkûkê pêkenok e.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî îro 3ê Îlona 2023an di peyama xwe ya li ser Twitterê de got: "Biryara îro ya Dadgeha Federalî pêkenok e."

Dadgeha Bilind a Federal a Iraqê îro derbarê radestkirina navenda Operasyonên Hevbeş li Kerkûkê PDKê rawestand û got jî: "Biryara Serokwezîrê Iraqê ya valakirina baregehê û radestkirina wê bo PDKê dê heta yekalîkirina wê dosyayê bê rawestandî."

33 baregehên PDKê li Kerkûkê hene û piraniya wan hatine valakirin, lê bregeha sereke ya Encûmena Serkirdatiya PDKê li Kerkûkê, heta niha ji aliyê Femandariya Operasyonên Kerkûkê ve dagîrkirî ye.

Ev yek di demekê de ye, roja 25ê Îlonê Serokwezîrê Iraqê Mihemed Şiya Sûdanî ferman dabû Femandariya Operasyonên Hevbeş ku baregehê vala bike û radestî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bike. Ev biryara Dadgeha Federalî rojek piştî xwepêşandanên welatîyên Kurd li Kerkûkê tê, ku di encamê de 4 welatîyên hatin şehîdkirin û 15 kesên din jî birîndar bûn. Herwiha zêdetir ji 40 kesî hatin girtin.

Nerina Azad

Amerîkayê ji bo Kerkûkê bangî Iraqê kir

Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê ji bo jinavbirina nakokiyên di navbera pêkhatiyên Kerkûkê de daxwaza cîbicîkirina madeya 140 a destûra Iraqê kir. Alîkarê Berdevkê Wezareta Derve



Karên ya Amerîkayê Vedant Patel li Washingtonê di civîneke çapemeniyê de li ser Kerkûkê bersiva pirsên nûçegihanê Rûdawê Diyar Kurde da. Patel tekez ku ew aloziya li Kerkûkê ji nêzik ve dişopînin û got: "Em wê tundiyê şermezar dîkin. Em ji malbatên kesên jiyana xwe ji dest daye re sersaxiyê dixwazin." Herwiha Patel bangî Iraqê kir û got, "Em bang li hemû aliyên dîkin ku bi diyalogê û bi cîbicîkirina madeya 140 a Destûra Iraqê pirsgirêkan çareser bikin.

Patel bersiva pirsê kirîza bûdçeyê ya di navbera Hewlêr û Bexdayê de jî da û diyar kir ku ew ji bo çareseriyê bi muxatabên xwe yên li Bexda û Hewlêrê re di nava danûstandinê de ne.

Ji ber ku rêya Hewlêr-Kerkûkê ji aliyê Heşda Şeibî ve ji trafikê re hatibû girtin, Kurdên Kerkûkê 2yê Îlonê li dijî ve kiryarê xwepêşandek li dar xist.

Hêzên ewlehiyê yên Iraqê gul li xwepêşanderan reşandibûn û di encamê de 4 Kurd şehîd ketibûn.

Li aliyê din, her çendî yasaya bûdçeyê ya Iraqê di rojnameya fermî de hatibû belavkirin jî, hikûmeta Bexdayê pişka bûdçeya Herêma Kurdistanê qut dike. Li Iraqê mûçeyên fermanberan ên meha Tebaxê hatin dayîn, lê fermanerên Herêma Kurdistanê hêj mûçeyên xwe yên meha Tîrmehê werne-girtine. Bi vê armancê doh ji Hewlêrê şandeyek çûbû Bexdayê û li wir daxuyaniyeke da çapemeniyê. Şandeyê hikûmeta Iraqê bi "şopandina siyaseta birçîkirina xelkê Herêma Kurdistanê" tohmetbar kir.

Rûdaw

Gundekî li Dêrazorê ji çeteyan hate paqijkirin

Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) ragihand ku gundê Hewayîcê bajarokê Zîbanê yê li rojhilatê Dêrazorê bi temamî ji çeteyan hatiye paqijkirin.

Navenda Ragihandinê ya QSD'ê daxuyaniyek weşand û

diyar kir ku gundê Hewayîcê bajarokê Zîbanê yê li rojhilatê Dêrazorê bi temamî ji çeteyan hatiye paqijkirin.

Di daxuyaniyê de hate gotin, di encama operasyonê de ji koma Dîfa El Wetanî 4 çete hatine girtin

û opreasyona li herêmê dewam dike.

QSD ji 27'ê Tebaxê û vir ve li herêma Dêrazorê li dijî çeteyên DAÎŞ'ê û bazirganên narkotîkê bi navê 'Xurtkirina Ewlehiyê' operasyonê dimeşîne.

anfkuirdi.com

Li ser daxwaza Serok Barzanî qurbanîyên Kerkûkê dê weke şehîd bêne qebûl kirin

4 Kurdên ku duh di encama gulebarana hêzên ewlehiyê yên Îraqê de li Kerkûkê jiyana xwe ji kesên di xwepêşandanan de birîndar bûne dê ji bo çareserkirina wan her cure alîkarî were kirin.



dest da, dê weke şehîd bête qebûl kirin.

Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Pêşewa Hewramî derbarê mijarê de daxuyanî da.

Pêşewa Hewramî ragihand ku li ser daxwaza Serok Mesûd Barzanî, Serokwezîrê Herêma Kurdistanê ferman da Wezaretê Şehîdan û Enfakiriyên ku serederiya şehîdan bi qurbanîyên bûyerên duh ên Kerkûkê were kirin.

Hewramî herwiha eşkere kir ku

Duh li Kerkûkê hêzên ewlehiyê yên Îraqê gule li xwepêşanderên Kurd reşandibû.

Di encamê de Hawkar Ebdullah, Heval Star Seîd, Samed Mihemed Ramazan û Husên Sabir ji yana xwe ji dest daa û 15 kesên din jî birîndar bûn.

Li Kerkûkê çi bûbû?

Artêşa Îraqê û hêzên Heşdî Şeibî di 16ê Cotmeha 2017an de derbasî bajarê Kerkûkê bûbûn.

Artêşa Îraqê û hêzên Heşdî

Şeibî avahiya Partiya Demokrata Kurdistanê vala kir û avahiyê kirin navenda Femandeya Operasyonê.

Li parêzgehên Îraqê û Kerkûkê dê 18ê Kanûna Pêşîn hîlbijartinên encumenên parêzgehan bête lidarxistin.

Beriya hîlbijartinan Serokwezîrê Îraqê Mihemed Şîya Sûdanî ferman dabû ku avahî careke din radeştî PDKyê were kirin.

Piştî vê biryarê, roja 25ê Tebaxê komek alîgirên Heşdî Şeibî û Ereben ku ji derve anîbûn li ber avahiyê kon vedabûn û rêya Kerkûk-Hewlêrê ji trafîkê re girtibûn.

Piştî vê rewşê, doh Kurd li herêma Rehîmawa ya Kerkûkê kom bûn û xwepêşandaneke li dar xistin û xwestin ku rêya Hewlêr-Kerkûkê bê vekirin.

Dema ku xwepêşanderên Kurd nêzikî devera ku çalakvanan berê rê lê girtibûn bûn, hêzên ewlehiyê gule li wan reşandin.

Polîsê Kerkûkê ragihand ku heta niha 4 kesan canê xwe ji dest daye û 15 kes jî birîndar bûne.

Berdevkê Polîsê Kerkûkê Amir Şiwanî ji Tora Medyayî ya Rûdawê re ragihand ku rêya Hewlêr û Kerkûkê jî bi fermî hatiye vekirin û hemû kelûpelên ku rê pê girtibûn hatin rakirin. **Nerina Azad**

Serokwezîr Mesrûr Barzanî derbarê rewşa bajarê Kerkûkê de peyamek belav kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî derbarê rewşa Kerkûkê de peyamek belav kir û tê de ragihand, "Em bi tundî ajawayên li dijî demokrasî û pêkvejiyana aştiyane ya li Kerkûkê şermezar dikin. Em şehîdbûn û birîndarbûna welatîyên Kurd ên ku ji



aliyê şovenîstan ve êrîş li wan hatine kirin, şermezar dikin."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî di peyama xwe de ragihand, "Em bi tundî karên têkderane yên li dijî demokrasî û pêkvejiyana aştiyane ya li Kerkûkê şermezar dikin. Em şehîdbûn û birîndarbûna welatîyên Kurd ên ku ji aliya şovenîstan ve êrîş li wan hatine kirin, şermezar dikin."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got: "Daxwaz ji Serokwezîrê Federal dikim ku bilez vê rewşa nexwestî kontrol bike û canê welatîyan û xwepêşanderan biparêze û êdî rê nede kesên bê berpîrsiyar rewşê aloztir bikin."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî herwiha got: "Di heman demê de ez bang li welatîyên me yên Kurd ên stemlêkirî li Kerkûkê dikim ku xwe xwe bigirin û xwe ji karvedanên tundiyê dûr bixin. Her wiha bang li welatîyên Ereben û Tirkmenên Kerkûkê yên resen jî dikim ku rê nedin kesên biyanî aramî û pêkvejiyana di navbera pêkhatayan de têk bidin." **Nerina Azad**

Li Dihokê xwepêşandan li dijî biryarên hikûmeta Îraqê bi rê ve çû

Li Dihokê, xwepêşandaneke befirêh li dijî biryarên hikûmeta Îraqê bi rê ve çû.



Bi hezaran welatîyên Dihokê îro, ji bo protestokirina biryarên Bexdayê yên li dijî Herêma Kurdistanê û şehîdkirina ciwanên Kurd ên li Kerkûkê, li Parka Newrozê kom bûn.

Di nava xwepêşandanê de pêkahate, sendîka û saziyên cuda, cuda beşdar bûn.

Xwepêşanderan ji hikûmeta Îraqê xwest ku pabendî yasaya bûdceyê û destûra bingehî bibe.

Herwiha xwepêşanderan ji hikûmeta Bexdayê xwest ku rêkeftinên xwe yên bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re cîbicî bike.

Di xwepêşandanê de, daxwaznameyek hate xwendin û organîzatorên xwepêşandanê ew daxwazname radeştî aliyên fermî yên parêzgeha Dihokê kir.

Parêzgarê Dihokê Elî Teter jî di xwepêşandanê de amade bû û got: "Em hatine daxwaza mafê xwe bikin. Ev daxwaziyên ku di vê xwepêşandanê de radeştî me hatine kirin em dê bidin balyozxane û aliyên siyasî."

Hikûmeta Herêma Kurdistanê dicive

Sibe Hikûmeta Herêma Kurdistanê dicive û biryarê li ser qebûl kirin an jî redkirina wan 500 milyar dînanan dide, ku Hikûmeta Îraqê jî bo Herêma Kurdistanê dişîne. **Nerina Azad**

AKP demografiya Xelatê diguherîne



Desthilatdariya AKP-MHP'ê bête navber demografiya Kurdistanê diguherîne. Ji bo Tirkên Ahiskayê li navçeya Xelatê ya Bedlîsê bi cih bike, dest bi çêkirina 300 avahiyan kir.

Tê gotin, avahî wê di nava mehekê de biqedin û nêzî 3 hezar Tirk ên Ahiskayî li van avahiyan bêne bicihkirin.

Bedlîs ku di dîroka Kurd û Kurdistanê de xwedî cihê girîng e, her tim bû hedefa dewleta Tirk. Plana Şark Islahat a ku sala 1925'an hate amadekirin di serî de Bedlîs li ser bi dehan bajarên Kurdan hate ferzkirin. Di vê çarçoveyê de li Bedlîs, Xelat, Elcewaz, Tetwanê mal û

erasesyên Kurdan hatin destekirin, beşeke mezin a Kurdan ber bi bajarên Tirkan ve hatin koçberkirin, axaftina bi Kurdî, navên bi Kurdî hatin qedexekirin. Dewleta Tirk ku dest danî ser mal û xaka Kurdan, koçberên Tirk li van deveran bi

cih kir.

Yek ji bajarên ku bi taybetî demografiya wê hate guhertin jî navçeyên Xelat û Elcewazê ne. Dewleta Tirk ji Asya Navîn, Kafkasya, Balkanan û Derya Reş bi hezaran malbat li Bedlîsê bi cih kir. Ji ber ku armanca guhertina demografiyê ya dewleta Tirk pêk nehat, vê carê jî gavên nû hatin avêtin. Di salên 1990'î de li Bedlîs û navçeyên wê bi sedan gund û gundik hatin şewitandin, valakirin, bi hezaran mirov hatin koçberkirin. Li gel van polîtîkayên dewletê jî gelê Kurd koç nekir, yan jî li xaka xwe vegeriya.

DI SALA 2016'AN DE TIRKÊN AHISKA LI XELATÊ HATIN BICIHKIRIN

Xelkê Bedlîsê li dijî polîtîkaya dewleta Tirk a sed salî ya ji bo guhertina demografiyê û asîmîlasyonê li ber xwe dide. Di salên 2016 û 2017'an de Tirkên Ahiska yên ji Ûkraynayê hatin

anîn bi taybetî li navçeya Xelatê ya Bedlîsê hatin bicihkirin. Di nava van salan de bi sedan avahî hatin avakirin, bi hezaran Tirk ên Ahiskayî li van avahiyan hatin bicihkirin.

Li Xelatê di hîlbijartinên xwecihî yên salên 2014 û 2019'an de tevî ku HDP bi ser ket, bi destwerdana AKP'ê û hîleyên li hîlbijartinê şaredarî radeştî namzetê AKP'yî hate kirin. Desthilatdariya AKP-MHP'ê ku lîstika xwe ya guhertina demografîk û asîmîlasyonê li Xelatê bi ser neket, careke din kete nava liv û tevgerê.

3 HEZAR KOÇBERÊN DIN LI XELATÊ TÊNE BICIHKIRIN


Li Xelatê helwesta Kurdan a xwedîderketina li xaka xwe û zêdebûna nifûsa Kurdan a li navçeyê AKP tirsand. AKP ku beriya niha koçberên Tirk li Xelatê bi cih kir û ji Erdogan re qesrek ava kir, polîtîkaya bicihkirina koçberên nû jinûve xiste dewrê.

Desthilatdariya AKP-MHP'ê ji bo li Xelatê nifûsa Kurdan jinûve biguherîne li navenda bajêr, li peravên Gola Wanê 300 avahiyên nû çêdike. Çêkirina avahiyan nêzî 3 meh in dewam dike û wê zêdeyî 3 hezar koçber lê bêne bicihkirin. Di salên 2016 û 2017'an de zêdeyî 2 hezar Tirk ên Ahiskayê ku ji Ûkraynayê hatin anîn, li vê herêmê hatin bicihkirin. Li heman qadê wê li avahiyên din jî dîsa Tirkên Ahiska bêne bicihkirin. Mesrefa avahiyan jî ji aliya desthilatdariya AKP-MHP'ê ve tê dayin.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê bangî Iraqê kir

Lijneya Wezîran a Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji hikûmeta Bexdayê xwest ku mafên darayî yên Herêma Kurdistanê li gorî wê rêjeya ku di yasaya bûdceyê de hatiye diyarkirin bide.

Lijneya Wezîran a Herêma Kurdistanê bi serokatiya Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî civiya.



Di civîna de ku Cîgirê Serokwezîr Qubad Talebanî jî tê de amade bû, pirsgirêka bûdceyê ya navbera Hewlêr û Bexdayê û pêşhatên Kerkûkê hatin gotûbêjkin.

Lijneya Wezîran tekez kir li ku di qanûna bûdceya federalî de hatiye diyarkirin divê Bexda hemû mûçeyên darayî yên mehane 1 trîlyon û 375 milyar dînar bişîne ku 906 milyar dînar ji bo mûçeyên fermanberên Herêma Kurdistanê tê dayîn.

Lijneyê aloziyên li Kerkûkê jê nirxand û serxaxî ji malbatên kesên ku di bûyerên vê dawiye yên bajêr de jiyana xwe ji dest daye xwest û hêviya başbûnê ji birîndaran re xwest.

Herwiha li jineyê tundûtûjiya li dijî welatîyên Kurd ên ku bi awayekî aştîyane li dijî zilma li Kerkûkê xwepêşandan li dar xistin, şermezar kir.

"Divê yên gule reşandine bîn darizandin"

Li aliyê din Lijneya Wezîran bangî Iraqê kir derbarê kesên ku li Kerkûkê gule li welatîyan reşandine û bûne sedema şehîdkirina welatîyan karûbarên yasayî bidin destpêkirin û bîn darizandin.

Di civînê de danûstandinên dawî yên navbera Hewlêr û Bexdayê ji bo cîbicîkirina yasaya bûdceya federalî ya Iraqê ya sala 2023yan hatin gotûbêjkin.

Lijneyê amaje bi wê yekê jî kir ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji mûçe û mafên darayî yên karmend û karmendên xwe berpirs e û helwesta Bexdayê ya li ser nedana van mafan weke nîgeran şîrove kir.

Di yasaya bûdceya Iraqê de bi giştî pişka Herêma Kurdistanê 16 trîlyon û 498 milyar dînar hatiye destnîşankirin.

Li gorî wê yekê her meh pêwîst e Bexda 1 trîlyon û 375 milyar dînar ji Hewlêrê re bişîne.

Lê di civîna 3ê Îlonê de hikûmeta Iraqê biryar da ku tenê 500 milyar dînar "wek deyn" ji bo mehên Îlon, Çiriya Pêşîn û Çiriya Paşîn ji Herêma Kurdistanê re bişîne.

Herwiha Bexdayê ji bo mehên Tîrmeh û Tebaxê ti mûçe nedaye Herêma Kurdistanê.

Lijneya Wezîran bal kişande ser wê yekê ku Herêma Kurdistanê ji roja 25ê Hezîrana 2023an ve ku yasaya bûdceyê ketiye meriyetê, erkên xwe yên li gorî yasayê cîbicî kirine.

Desteyê hikûmeta Iraqê vexwend ku wê biryarê binirxîne û bag kir ku mafên Herêma Kurdistanê yên darayî bi hejmarên ku di yasaya bûdceyê de hatine diyarkirin bidin.

Herwiha li jineyê tekez kir ku li seranserê Iraqê mûçeyên mehane bê dereng tînin dayîn û divê li Herêma Kurdistanê jî heman pîvan bîn cîbicîkirin.

Rûdaw

Serokê Herêma Kurdistanê û Serokwezîrê Iraqê rewşa Kerkûkê gotûbêj dikin

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Serokwezîrê Iraqê Mihemed Şiya Sûdanî di peywendiyêke telefonî de rewşa Kerkûkê gotûbêj kirin.

Herdu aliyan, tekezî li ser wê yekê kir ku pêwîst e bilez tedbîr ji bo parastina aramî û ewlehiya Kerkûkê bîn girtin.

Nêçîrvan Barzanî û Mihemed Şiya Sûdanî herwiha got ku divê rê li ber li her hewleke têkdana pêkvejiyan û asayîşa bajar were girtin. Herdu aliyan, herwiha tekez kir ku divê hêzên asayîşa bajêr, bê cudahî hemû pêkhatayan biparêzin û aramî û ewlehiyê pêk bînin.

Serokê Herêma Kurdistanê û



Serokwezîrê Iraqê herwiha gotin ku, divê kesên ku gule berdane xwepêşanderan û di encamê de

şehîd û birîndar çêbûne, lêkolîn li ser wan were kirin û rastî yasayê werin.

KDP.info

Xwepêşandana Revenda Kurd li Londonê ji bo piştevaniya Kerkûkê



Revenda Kurd li Londonê ji bo piştevaniya xelkê Kerkûkê û şermezarkirina şehîdbûna welatîyên Kurd ên li wî bajarî, xwepêşandeke nerazîbûnê encam didin.

Revenda Kurd li Londonê ji bo piştevaniya xelkê Kerkûkê û şermezarkirina şehîdbûna welatîyên Kurd ên li wî bajarî, xwepêşandeke nerazîbûnê encam didin, ku di nav xwepêşandanê de ji bilî Kurdên hemû parçeyên Kurdistanê, kesên din jî beşdar in.

Îro Sêşemê 5ê Îlona 2023an, Revenda Kurd li ber Balyozxaneya Iraqê ya li Londona paytexta Brîtanyayê ji bo piştevaniya xelkê Kerkûkê û şermezarkirina şehîdbû-

na welatîyên Kurd ên li wî bajarî, xwepêşandaneke nerazîbûnê encam didin, ku di nav xwepêşandanê de ji bilî Kurdan, kesên din jî beşdar in û piştevaniya Herêma Kurdistanê dikin. Xwepêşanderên Revenda Kurd, helwesta hikûmeta Iraqê ya li hember neşandina mafên Herêma Kurdistanê yên di budceya federalî de şermezar kirin, herwiha xwestin nivîsek bigihînin berpirsên Balyozxaneya Iraqê ya li Londonê ku naveroka wê li ser rewşa Kurdên li Kerkûkê û helwesta Iraqê li hember mafên darayî yên Herêma Kurdistanê ye.

Rêkxerên xwepêşandanê ji Kurdistanê re diyar kirin, tiştê li

Kerkûkê rûdide, berdewama prosyeyên jenosîdkirina Kurdan a di serdemên cuda cuda yên Iraqê de ye, herwiha tekez kirin ku dixwazin di xwepêşandaneke sivil de peyama nerazîbûnê bigihînin berpirsên Balyozxaneya Iraqê ya li Londonê.

Xwepêşanderan daxwaz kirin ku Heşda Şeibî li Kerkûkê nemîne û dawî li serbazgehkirina bajêr were anîn û Madeya 140 a Destûra Iraqê were cîbicîkirin.

Êvara roja Şemiyê 2ê Îlona 2023an, hejmarek ciwanên Kurd ên nişteciyên taxên Şoraw û Rehîmawa yên li Kerkûkê li dijî girtina rêya sereke ya Hewlêr – Kerkûkê ji aliyê hinek Ereb û Tirkmenan ve, xwepêşandan kirin. Di xwepêşandanê de alozî derket û hêzên ewlehiyê gulle reşandin ser xwepêşanderên Kurd. Ji ber reşandina gulleyan ji aliyê hêzên ewlehiyê ve bi ser xwepêşanderan de, çar welatîyên Kurd ên Kerkûkê yên bi navên "Hawkar Ebdullah, Heval Star, Semed Mihemed û Husên Sabir" şehîd bûn û nêzîkî 15 kes jî birîndar bûn.

Tevî şehîdkirin û birîndarkirina welatîyên Kurd li Kerkûkê, hêzên ewlehiyê yên Kerkûkê, çar roj-namevan û xebatkarên medyayê jî desteser kirin û yek jî birîndar kirin.

Nerina Azad

Kompanyên Misrî li Kurdistanê projeyan pêk tînin

Cîgirê Serokê Karûbarên Hawirde û Hinardekirinê li Herêma Kurdistanê Eta Mihemed got ku, biryar e lûtkeya Iraq û Misrê li Herêma Kurdistanê were lidarxistin bi mebesta kişandina kompaniyên Misrî û hinardekirina kelûpelan ji Herêma Kurdistanê. Eta Mihemed ji malpera KDP.info re ragihand: "Biryar e lûtkeya Iraq û Misrê li Herêma Kurdistanê were lidarxistin. Kompanyên Misrî tînin Kurdistanê ji bo hinartina kelûpelên pêwîst ji Misrê re kar bikin ku kompaniyên wan dê werin û li Kurdistanê projeyan pêk bînin."

Mihemed wiha got: "Em dixwazin bi riya wê lûtkeyê kompaniyên wan bikşînin Herêma Kurdistanê û li gel kompaniyên me kar



bikin, ji ber wê jî lûtke girîng e û biryar e di 24ê Mijdarê de were lidarxistin û piştê li Iraqê were lidarx-

istin, ji ber wê jî hewlên ji bo kişandina kompaniyên biyanî berdewaran.

KDP.info

Hikûmeta Kurdistanê bang li civaka navdewletî dike: Piştevaniya mafên me bikin û nehêlin êdî mafên xelkê me werin binpêkirin

Encûmena Wezîran a Herêma Kurdistanê îro çarşemê 6ê Îlona 2023an, bi serperîştîya Serokê

Piştî li ser pêşhatayên herî dawî yê cîbicîkirina yasaya budceya federal a ji bo sala darayî ya

Encûmena Wezîran di ber ronahiya van rastiyan de daxwaz dike ku Encûmena Wezîran a Iraqê bi awayekî dadperwerane biryara xwe li ber çavan derbas bike û heqên darayî yê Herêmê bi wan hejmarên ku di lîsteyên budceyê de hatine, ji Herêmê re bişîne, bi taybetî jî terxankirinên mûçeyan ku mehane 906 milyar dînar e, da ku Herêma Kurdistanê jî bikare mûçeyên mûçexurên Herêmê bide, wek mûçexurên seranserê Iraqê ku mehane bêyî paşketin ji wan re mûçê tene şandin, loma divê bi heman pîvanê, terxankirinên mûçeyên Herêmê di nav budceya Iraqê de wek xwe werin şandin û bi awayekî cuda û nedadperwerane serederî ligel Herêmê neyê kirin, li gor destûr û çarçoveya bingeha wejhevîyê li hember cîbicîkirina yasayan ligel wê serederî were kirin.

Di heman demê de Encûmena Wezîran daxwazê ji hêz û aliyên siyasî yê Herêmê dike ku yekdeng û yekhelwest bin di dakokîkirina maf û desthilat û heqên destûrî yê Herêmê de, ji bo vê mebestê jî, pêşniyaza cezakirina civîneke berfireh a hêz û aliyên siyasî yê Herêmê hat kirin ji bo derxistina rastiyan.

Herwiha Encûmena Wezîran daxwazê ji hêz û aliyên siyasî yê sereke yê pêkhênerên hikûmeta Iraqê dike ku heqên Herêmê wek di lîsteyên budceyê de hatine, werin şandin û pabend bin bi mînhaca wezarî û rêkeftinên siyasî yê pêkanîna hikûmetê û di wê çarçoveyê de jî, serederî ligel maf û heqên darayî yê Herêma Kurdistanê bikin.

Encûmena Wezîran daxwazê ji civaka navdewletî jî dike ku piştevanê Herêma Kurdistanê bin di bidestxistina mafên destûrî û heqên darayî de li gor destûr û rêkeftin û rê nedin êdî mafên xelkê Kurdistanê bi awayekî nerewa werin binpêkirin.

KDP.info

Pêşewa Hewramanî: Hikûmeta Iraqê siyaseta birçîkirinê li dijî Herêma Kurdistanê dimeşîne

Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Pêşewa Hewramanî ragihand, hikûmeta Iraqê siyaseta birçîkirinê li dijî gelê Herêma Kurdistanê dimeşîne.

Tîma Hikûmeta Herêma Kurdistanê îro 4ê Îlona 2023an di konferanseke rojnamevanî de helwesta xwe ya derbarê mûçê û budceyê de eşkere kir.



Pêşewa Hewramanî di konferansa rojnamevanî got: Tiştê ku em di hikûmeta Iraqê de dibînin, siyaseta birçîkirinê û têkelkirina mafên gelê Herêma Kurdistanê bi pirsên siyasî re ye.

Pêşewa Hewramanî got, hikûmeta Herêma Kurdistanê her ji destpêka danûstandinên ligel hikûmeta federalî ve, bi berdewam hewl daye rêkeftinên ligel hikûmeta Iraqê cîbicî bike, lê aliyê ku pabendî rêkeftinan nebûye, hikûmeta Iraqê ye.

Got jî: Hikûmeta Iraqê biryar da ku mehane tenê 500 milyar dînar ji bo mûçeyên Hikûmeta Herêma Kurdistanê bişîne, lê hemberê pêwîstiya Herêma Kurdistanê bi 940 milyar dînar heye û tiştên ku hikûmeta Iraqê dişîne têra dabeşkirina mûçê nake.

Pêşewa Hewramanî destnîşan kir : Ew zîhniyeta ku li Pelkane û deverên din ji axa Herêma Kurdistanê dagîr kirine, bi navê dadgehên biryaran li dijî Herêma Kurdistanê derdixe û ciwanên Kurd li Kerkûkê şehîd dike, heman zîhniyeta berê ye ya ku li dijî gelê Herêma Kurdistanê hebû.

Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê got: "Em ji her danûstandinekê re amade ne. Hikûmeta Herêma Kurdistanê dê bi niyaza baş û bi aramî berdewamiyê bi danûstandinan bide, lê em nizanin dê heta kengî ev aramî berdewam bike."

Nerina Azad



Encûmena Wezîran Mesrûr Barzanî û bi amadebûna Cîgirê Serokwezîr Qubad Talebanî civiya.

Di destpêka civînê de Serokwezîr Mesrûr Barzanî bi navê Encûmena Wezîran, sersaxî û hevxiyatiya ligel malbat û kesûkarên şehîdên bûyerên çend roj berê yê Kerkûkê nîşan da û hêviya başbûna bilez ji bo birîndaran xwest. Di heman demê de Encûmena Wezîran bi tundî ew tundûtûjîyê şermezar kir ku li hember welatîyên sivîl ên Kerkûkê hatin kirin, ku bi awayekî gelek aştîyane xwepêşandana xwe dikirin û nerazîbûna xwe li hember wê zilma ku li welatîyên Kurd ên Kerkûkê tene kirin, nîşan didan, lê belê mixabin bi teqekirin û rijandina xwînê bersiva wan hat dayîn.

Encûmena Wezîran daxwazê ji Hikûmeta Federal û aliyên pêwendîdar dike ku ewên çek bi kar anîn ji bo rûbirûbûna xwepêşanderan û bûn sedema şehîdkirina welatîyên sivîl ên li Kerkûkê, divê bi demildest rêkarên yasayî derbarê wan de werin kirin û radestî dadgehê werin kirin, da ku bigihin cezayê xwe.

2023an gotûbêj hat kirin, dûvre encamên gotûbêja şanda danûstandinê ya Herêma Kurdistanê piştî civîna wan a ligel şanda Hikûmeta Federal a li Bexdayê li ser maf û heqên darayî yê Herêma Kurdistanê, ji aliyê endamên şandê ve hat pêşkêşkirin.

Encûmena Wezîran tekezî li wê yekê kir ku li hember pabendiyên Herêmê, divê hemû mafên darayî werin şandin, ku li gor lîsteyên budceya Iraqê yê ji bo sala 2023an dike 16 trilyon û 497 milyar dînar, ku mehane li gor hejmarên budceyê dike 1 trilyon û 375 milyar dînar, lê belê Encûmena Wezîran a Iraqê di civîna xwe de roja 3ê Îlona 2023an, li derveyî lîsteyên budce û mafên darayî yê Herêmê, biryar da ku bi awayekî deyn, tenê bi qasî 500 milyar dînar di mehên 9, 10, 11 de werin şandin, ev di demekê de ku piştî meha 6an ve, ti pere ji bo mûçeyên mehên 7 û 8 nehatine şandin. Ev jî di demekê de ye ku her ligel ketina warê cîbicîkirinê ya yasaya budceya Iraqê 25ê Hezîrana 2023an ve, Herêmê pabendiyên xwe li gor yasaya budceyê cîbicî kirine.

Endamê Serokatiya MSDyê: Rejîm û Îran fitneyê li Dêrezorê çêdikin

Endamê Meclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD) Şikrî Şêxanî ragihand ku hikûmeta Sûriyeyê û Îran fitneyê li Dêrezorê çêdikin.

Endamê Meclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD) Şikrî Şêxanî ragihand ku hikûmeta Sûriyeyê û Îran fitneyê li Dêrezorê çêdikin.

Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) hewl didin gund û bajarokên li ber Çemê Feratê, ji Zîban heta Baxozê ji destê çekdarên ku piştevaniya Ebû Xewle û Îbrahîm el-Hifil dikin, derxînin.

Hêzên Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) yê ser bi HSDyê ve xwe ji bo çûna nav bajarokê Zîbanê amade dikin.

Armanca operasyonê derxistina van grûpên çekdar ji nav çend gund û bajarokên li ser qeraxên Çemê Feratê ye.

Li gorî zanyariyên ajansa Rûdawê, çekdarên alîgirên Ebû Xewle nêzîkî 18 gundan ji Zîban heta Hecîn û Baxoz li hember Bûkemalê kontrol



Zîban gundê Îbrahîm el-Hifil e ku yek ji şêxên eşîra Ikêdat e û bi eşkereyî çek li hemberî HSDyê hilgirtiye û ji eşîrê xwestîye êrişî HSDyê bike. Derbarê vê yekê de Navenda Ragihandina HSDyê daxuyaniyek belav kir.

HSDyê nîşan bi wê yekê daye ku kesê bi navê Îbrahîm El Hefel ji aliyê

hêzên wan ve tê xwestin.

Li gorî daxuyaniyê Îbrahîm El Hefel bûye sedema rijandina xwîna şervanan, derbiderkirina welatîyên sivîl, têkdana saziyên xizmetguzariyê û gurkirina fitneyê.

Her derbarê şerê Dêrezorê de, Endamê Encûmena Serokatiya MSDyê Şikrî Şêxanî ji Rûdawê re got ku tiştê dibe ji bo hilweşandina Rêve-

beriya Xweser fitneyek e.

Şikrî Şêxanî got, "Tiştê ku bi rastî li navçeya Dêrezorê çêdibe fitneyek e hatiye hûnandin û plankirin û cîbicîkirin ji aliyê milîsên Îranê ve, ji aliyê pasdaran ve bi fermana Îstixbaratên Îranê.

Herwiha rejîma Sûriyeyê jî bi temamî beşdarî vê fitneyê ye ji bo têkdana stûnên Rêveberiya Xweser û hilweşandina Rêveberiyê ye.

Ew tenê fitneyek e ne kêma û ne zêde, dixwazin weke dijminatîyeke Kurdî- Erebnî nîşan bidin lê bi rastî fitneyek e mezhebî ye Sûriyeyê û Îranê xwest bi rêya wê aloziyê li navçeyê derxînin."

Hevdem bi şerê Dêrezorê re çekdarên opozisyona Sûriyê êrişî gundê Tewîleyê yê 10 kîlometreyan li rojavayê Til Temirê kiribû û kontrolkirina wî ragihandibû. Çavkaniyekê ji navçeyê ji Rûdawê re tekez kir ku Encûmena Leşkerî ya Til Temirê, gund ji destê çekdarên opozisyone derxistiye û bi temamî kontrol kiriye.

Nerina Azad

Şaxewan Ebdullah: Me ji 30 ciwanên Kerkûkê 26 ciwan azad kirin

Cîgirê Serokê Parlamentoya Iraqê Şaxewan Ebdullah di şîna şehîdên xwepêşandanên roja 2ê Îlonê yê Kerkûkê de ragihand, duh ji 30 ciwanan, 26 ciwan azad kirine.



Cîgirê Serokê Parlamentoya Iraqê Şaxewan Ebdullah di şîna şehîdên xwepêşandanên roja 2ê Îlonê yê Kerkûkê de ragihand, duh ji 30 ciwanan, 26 ciwan azad kirine.

Şaxewan Ebdullah ji ajansa Kurdistan24ê re ragihand: "Duh me ji 30 ciwanan, 26 ciwan azad kir, tenê 4 kes mane, ku goya du ji wan demançe hilgirtine, ji bo wan jî em li ser xetê ne, rast e beşek ji desteserkiriyên ser bi partiyeke din in, heta niha em li ser xetê ne, da ku ew çar kes jî werin azadkirin."

Cîgirê Serokê Parlamentoya Iraqê Şaxewan Ebdullah îro tevî şandekê beşdarî şîna şehîdên Kerkûkê bûn.

Şaxewan Ebdullah ji Kurdistan24ê re diyar kir: "Çend ciwanên me bi neheqî hatin şehîdkirin û me di civîna xwe ya ligel Serokwezîrê Iraqê de jê re ragihand ku tiştê li Kerkûkê rûda, nayê qebûlkirin û nabe çend xelkê Hewîceyê bîn taxên Kurdan ên Kerkûkê û xelkê Kurd hêrs bikin û dema çend rojan rêya wan bigrin, bêyî ku hikûmet ti pêngavekê biavêje."


Ebdullah eşkere kir: "Me daxwaz kir, hemû wan kesên ku destê wan di kuştina wan ciwanan de heye, werin cezakirin." Li ser vê mijarê, "Serokwezîrê Iraqê soz daye, di asta bilind de fermanbaran biguherîne û lêkolînê cidî li ser vê mijarê bikin û qurbanîyan qerebû bikin".

Nerina Azad

Wezaretê Derve ya Amerîkayê tundûtûjiyên li Kerkûkê şermezar dike

Wezaretê Derve ya Amerîkayê ragihand, ew ji nêzik ve çavdêriya aloziyên van demên dawî yê bajarê Kerkûkê dikin û daxwaza aktîvkirina Madeya 140 û çareserkirina kêşeyan bi rêya diyalogê dikin.

Cîgirê Berdevkê Wezaretê Derve ya Amerîkayê Vedant Patel di konferanseke rojnamevanî de li ser rewşa Kerkûkê helwesta welatê xwe eşkere kir û ragihand: "Em tundûtûjiyên van demên dawî yê li Kerkûkê şermezar dikin û sersaxiyê li malbatên qurbanîyên xwepêşandanên bajarê Kerkûkê dikin."



Vedant Patel ji aliyên daxwaz kir ku kêşeyan bi rêya diyalogê çareser bikin û ji bo çareserkirina bingehîn a kêşeyên Kerkûkê, cîbicîkirina Madeya 140 a Destûra Iraqê were aktîvkirin. Êvara roja Şemiyê 2ê Îlona 2023an, hejmarek ciwanên Kurd ên nişteciyên taxên Şoraw û Rehîmawa yê li Kerkûkê li dijî girtina rêya sereke ya Hewlêr - Kerkûkê ji aliyê hinek Ereb û Tirkmenan ve, xwepêşandan kirin. Di xwepêşandanê de alozî derket û hêzên ewlehiyê gulle reşandin ser xwepêşandêrên Kurd. Ji ber reşandina gulleyan ji aliyê hêzên ewlehiyê ve bi ser xwepêşandêran de, çar welatîyên Kurd ên Kerkûkê yê bi navên "Hawkar Ebdullah, Heval Star, Semed Mihemed û Husên Sabir" şehîd bûn û nêzikî 15 kes jî birîndar bûn.

Tevî şehîdkirin û birîndarkirina welatîyên Kurd li Kerkûkê, hêzên ewlehiyê yê Kerkûkê, çar rojnamevan û xebatkarên medyayê jî desteser kirin û yek jî birîndar kirin.

Nerina Azad

Hoşyar Zêbarî: Dema wê hatiye ku dadgeheke destûrî ya bihêz bê avakirin

Siyasetmedarê Kurd Hoşyar Zêbarî dibêje, biryarên vê dawiyê yê Dadgeha Federalî ya Iraqê seyr û nedestûrî ne û dibêje: "Dema wê hatiye ku dadgeheke destûrî ya bihêz bê avakirin."

Siyasetmedarê Kurd Hoşyar Zêbarî li ser Twitterê nivîsî: "Biryarên vê dawiyê yê Dadgeha Federalî ya Iraqê seyr û nedestûrî ne û ji ber wê jî biryarên Serokwezîrê Iraqê yê vekirina baregeha PDKê li Kerkûkê û cîbicîkirina rêkeftina ligel kuweytê hilweşandin." Hoşyar Zêbarî di twîterê de wiha amaje bi wê yekê kir: "Ev zordariyeke metirsîdar e."

Herwiha tekezî kir jî: "Dema wê hatiye ku dadgeheke destûrî ya bihêz bê avakirin."

Hoşyar Zêbarî di tweeta xwe de amaje bi malikeke şairê Ereb ê navdar El-mutenebî kir û got: "Hevrikî bi te re ye û tu hevrik û dadwer î." Dadgeha Bilind a Federal a Iraqê roja 3ê vê mehê biryara radestkirina PDKê li Kerkûkê rawestand û got jî: "Biryara Serokwezîrê Iraqê ya valaki-



rina baregehê û radestkirina wê bo PDKê dê heta yekalîkirina wê dosyayê bê rawestandî."

33 baregehên PDKê li Kerkûkê hene û piraniya wan hatine valakirin, lê baregeha sereke ya Encûmena Serkirdatiya PDKê li Kerkûkê, heta niha ji aliyê Femandariya Operasy-

onên Kerkûkê ve dagîrkirî ye.

Ev yek di demekê de ye, roja 25ê Îlonê Serokwezîrê Iraqê Mihemed Şiya Sûdanî ferman dabû Femandariya Operasyonên Hevbeş ku baregehê vala bike û radestî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bike.

Nerina Azad

Partî û aliyên siyasî yê Rojhilatê Kurdistanê greva giştî ragihandin

Di salvegera yekemîn a serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' de partî û aliyên siyasî yê li Rojhilatê Kurdistanê di 16ê Îlonê de greva giştî ragihandin û

çû ku êdî paşde jî nazivire. Rola berçav ya jinan di pêşengtiya wê şoreşê de, bû sedem ku civaka me di milê civakî de pêngavek din ber bi

(PAK)

- Komeleya zehmetkêşên Kurdistanê

Li ser xalên jêr lihev kirin:

1- Piştevanîkirin ji daxwazên têkoşerên civaka sivil û rêxistinên serbixwe ji bo rêzgirtin û beşdariya çalak a salroja şoreşa Jin, Jiyan, Azadî;

2- Ragihandina roja 25-06-1402 (16-09-2023) weke roja greva giştî li hemû Kurdistanê. Di wê rojê de hemû dikan û bazar û navendên kar û îdarî bêne girtin. Serê sibeha wê rojê girseya xelkê Kurdistanê di bajar û navçe û gundên Kurdistanê de serdana aramgeha Jîniya ciwan û hemû şehîd û cangoriyên şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî"yê bikin û destegulên rêz û xweşewîtiyê ser aramgehên wan danên û merasima rêzgirtinê birêve bibin.

3- Daxwaz ji hemû xelkê azadîxwaz yê Îranê (jin, ciwan, karker, mamosta, xanenişîn, jîngehparêz û neteweyên bindest) li sertaserê Îranê dikin ku piştevaniya gireva xelkê Kurdistanê bikin û bi gireveke giştî nîşanî hemûyan bidin ku şoreşa 'Jin, Jiyan, Azadî' heya gihiştin bi armancên xwe wê berdewam be.

4- Daxwaz ji hemû têkoşerên çalak, hêz û aliyên pêşketinxwaz yê derveyî welat dikin ku bi hemû awayekî piştevaniya xwe ji bo gireva giştî ya salroja şoreşê bikin û di wê rojê de xwepêşandan û meşên girseyî birêve bibin û bala hemû civakên mirovhez ên cihanê bikêşnin ser piştevanî şoreşa jîniyê.

5- Her yek ji partî û aliyên siyasî yê Kurdistanê ku beşdariya wê rûniştinê bûne, piştevanî û beşdariya xwe ji bo gireva roja 25-06-1402 (16-09-2023) û merasimên ser aramgehên şehîd û cangoriyan radigihînin."

anfurdi.com



banga tevlibûnê kirin.

Partî û aliyên siyasî yê Rojhilatê Kurdistanê ji ber salvegera yekemîn a destpêkirina serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' daxuyaniyeke hevpar weşandin.

Di daxuyaniyê de hate ragihandin jin a Kurd a ciwan a ji bajarê Seqizê Jîna li Tehranê di encama êrîşa hêzên dewletê de jiyana xwe ji dest da û bû sembola serhildana girseyî ya bi dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî', ku li Kurdistanê destpê kir û li hemû bajar û navçeyên Îranê û derveyî welat belav bû.

Hate destnîşankirin ku ev serhildan a ku weke 'Şoreşa Jîna' jî tê naskirin, bû serhildan û nerazîbûna herî girseyî û dirêj ku desthilatdariya Komara Îslamî xiste ber lêpîrsînê û hate gotin, "Sala bihurî û di proseya wê şoreşê de tevgera azadîxwaz a xelkê Îranê bi giştî û xelkê Kurdistanê bi taybetî li dijî rejîma desthilatdar di Îranê de ezmûna pêvajoyeke nû û girseyî kir û gaveke berdewam pêşde

pêş ve biçû û asoya serketinê ronîtir bibe. Ciwanan di jortirîn asta fedakariyê de ji bo jiyaneke azad û dilxwaz fedakariyeke bêhempa kirin."

Daxuyaniyê bi vî rengî dewam kir:

"Di salvegera destpêkirina şoreşa Jîniyê de, di cih de ye ku ji bo rêzgirtina şehîdên wê şoreşa nû û rêzgirtin ji cangoriyan û zindaniyên siyasî û her wiha zindîhiştina wê tevgera siyasî, em bi awayekî xurt ber bi pêşwaziya wê boneya mezin ya siyasî û civakî ve biçin. Ji bo wê yekê piştî çend hevdîtin û ravêjen siyasî, roja Çarşemiyê 15-06-1402 (06-09-2023) partiyên siyasî yê Rojhilatê Kurdistanê yê wek:

- Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê (HDKÎ)
- Komele (Rêxistina Kurdistanî ya Hizba Komunîsta Îranê)
- Patiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK)
- Rêxistina Xebata Kurdistanê Îranê (Sazimanî Xebat)
- Partiya Azadiya Kurdistanê

Mesrûr Barzanî di civîna ligel şanda Parlamentoya Kanadayê de: Dest ji mafên xwe yên rewa û destûrî bernadin



Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 4ê Îlona 2023an pêşwaziya şandeke Parlamentoya Kanadayê bi serokatiya parlamenter Tom Kmiec kir.

Serokê şanda Kanadî kurteyek derbarê kar û çalakiyên Koma Parlamenterên Dostê Kurd li Parlamentoya Kanadayê pêşkêş kir, ku ji hejmarek parlamenterên piraniya par-

tiyên Kanada pêk hatiye û armanca wan piştevaniya doza Kurdî û pêşxistina pêwendiyên di navbera Kanadayê û Herêma Kurdistanê de ye.

Her wiha şanda mêvan rewşa pêkvejiyana aştiyane, azadiya olî û azadiya ragihandinê li Herêma Kurdistanê bilind nixand, ku hevşeweyê azadîyên ku li Kanadayê hene ye.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî spasiya hevkarî û piştevaniya Kanadayê bo Herêma Kurdistanê kir, bi taybetî di şerê dijî terorîstên DAIŞê de.

Di mijareke din a civînê de, Serokwezîrê Mesrûr Barzanî bal kişand li ser pêşatên dawî yên di warê pêwendiyên li gel hikûmeta federal de û aşkere kir ku Herêma Kurdistanê hemû erkên xwe yên di çarçoveya destûrê de cih anîye, lê cihê mixabinî û dilgiraniyeke mezin ku mafên gelê Kurdistanê bi awayekî gelek nedadperwerî û nedestûrî tê binpêkirin û rêz li rêkeftina aliyên ku hikûmetê ava kirine û karnameya hikûmetê nayê girtin ku li Encûmena Nûneran a Iraqê bi piraniya dangan hatiye pesendkirin.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî tekezî li ser wê yekê kir ku gelê Kurdistanê bi ti awayî dest ji mafên xwe yên rewa û destûrî bernade û serê xwe li ber ti fişar û gefên wan aliyan natewîne ku dixwazin Iraqê vegeştin serdema dîktatorî, zordarî û çewsandina gelê Kurdistanê. **Nerina Azad**

Îlham Ehmed li ser şerê Dêrezorê: Îran û Sûriya van aloziyan derdixin

Îlham Ehmed li ser şerê Dêrezorê: Îran û Sûriya van aloziyan derdixin.

Seroka Desteya Cîbicîkar a Encûmena Sûriyeya Demokratîk (MSD) ragihand ku li Dêrezorê “şerekî giran” derketiye.



Şer û pevçûnên dijwar ên di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) û beşeke Encûmena Leşkerî ya Dêrezorê û hinek eşîran de berdewam in. Seroka Desteya Cîbicîkar a Encûmena Sûriyeya Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed li ser tora civakî ya Xê daxuyaniyek belav kir.

Îlham Ehmedê got, “Ev herêm bi saya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û Hevpeymaniya Navdewletî ji destê DAIŞê hat rizgarkirin. Ji bo aramiya gelên Bakurê Rohhilatê Sûriyeyê şer kirin û bi ser ketin.”

“Delîl hene ku Îran û Sûriya van aloziyan derdixin”

Seroka Desteya Cîbicîkar a Encûmena Sûriyeya Demokratîk (MSD) Îlham Ehmedê diyar kir ku ev şer û pevçûn ne bûyerên yek-carî ne û anî ziman:

“Delîl hene ku ev alozî ji aliyê çekdarên ser bi Îran û rejîma Sûriyeyê ve tene birêve birin ku dixwazin alozî û bêîstîqrariyê li seranserê herêmê çêbikin.

Îran û rejîma Esed dixwaze vê aloziyê wek encama nakokiya etnikî ya di navbera Ereban û Kurdan de nîşan bide û xelkê Sûriyeyê ji xwepêşandanan li başûrê Sûriyeyê dûr bixe.”

Îlham Ehmedê got, “Çima Îran û rejîma Sûriyeyê dixwaze vê yekê bikin?” û anî ziman:

“Hewldana derxistina leşkerên Amerîkî ji Sûriyeyê aranceke din e. Dibe ku ew hewl didin piştgiriya navneteweyî bi dest bixin, bi nîşandana rewşa ku ji aliyê eşîrên Ereban ve tê meşandin.”

Îlham Ehmedê diyar kir ku şer û pevçûn dê bandoreke mezin bike û aramiya “bakurê rojhilatê Sûriyeyê” dixwe metirsiyê.

Îlham Ehmedê herwiha anî ziman, “Xelkê bakurê rojhilatê Sûriyeyê hêjayî wê ye ku li herêma xwe xwedî aramî û ewlehiyê be.”

Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) ragihand ku di şer û pevçûnan de heta niha 31 kes hatine kuştin.

Çi bûbû?

Şeva yekşemê hêzên taybet ên Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) li parêzgeha Dêrezorê operasyoneke berfireh a bi navê “Xurtkirina Ewlehiyê” dabû destpêkirin.

Di operasyonên HSDyê de serokê Encûmena Leşkerî ya Dêrezorê Ehmed el-Xebîl Ebû Xewle û çend kesên nêzîkî wî hatibûn desteser kirin.

Piştî desteser kirina serokê Encûmena Leşkerî ya Dêrezorê Ehmed el-Xebîl Ebû Xewle, li herêmê alozî gur bûn. Li ser vê yekê, alîgirên Ebû Xewle êrişî xalên HSDyê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn kir.

Herwiha çekdarên din jî êrişî binkeya HSDyê ya li bajarokê El Besîrayê yê li gundewarê rojhilatê Dêrezorê kir. **Nerina Azad**

Ebdûlazîz Qasim: Şerê Dêrezorê û dijminatîya Gelê Kurd

Di sala 2019'an de, ji dest rêxistina terorîst ya DAIŞê bi alîkariya hêzên HSD û koalisyona Navneteweyî ya li dijî terorê bi rêberiya Amerîka hatin rizgar kirin, lê bi carekî ev dever ji çeteyên DAIŞê nehatin paqijkirin û car car ji aliyê grûpên veşartî yên DAIŞê êriş li dijî HSD dihatin pêkanîn, tevî ku hejmarên mezin ji van çeteyên terorîst ji girtîgehên Rêveberiya Xweser bi piştgiriya eşîrên Ereban dihatin berdan û gelek ji wan tevî hêzên parastinê yên Rêveberiya Xweser bûn, ku heta îro jî tatkiliyên hin serok eşîrên ereb yên Dêrezorê û Hesekê bi aliyên cuda re hene, bi taybetî ligel Îranê û Tirkiyê û rejîma Şamê.

Her ji berî çend mehan ve, wiha dihat pêşbînîkirin ku şerekî mezin li demeke nêzîk li Dêrezorê di navbera hêzên girêdayî Amerîka û hêzên girêdayî Îranê û Hizibulah de peyda bibe, ji bo vê armançê ji aliyê koalisyona Navdewletî li dijî DAIŞê ya bi rêberiya Amerîka û bi alîkariya Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD), hêzeke leşkerî ji eşîrên ereban (Encûmena Leşkerî ya Dêrezorê) ji eşîrên erebên Dêrezorê hate damezrandin bo amadekariya şerekî wisa.

ku ji demek dirêj ve, hêzên Amerîka li Sûriyê hewla kontrolkirina tevahiya parêzgeha Dêrezorê didin û herwiha kontrolkirina tevaya sînorê Sûriyê-Îraqê heta bigehêja sînorê Ordîne (Jordan) ji bo rêgirtin li bizavên milîsên girêdayî Pasdarê Îranê û Hizibulah û girûpên bazirganiya madde hişber, nemaze bazirganiya Captagon li van deveran, ku hêjayî gotinê ye tevî girîngiya cografiyê ya parêzgeha Dêrezorê herwiha girîngiyek aborî mezin heye ji ber neft û gaz wê ya zaf û zêdebarî girîngiya çemê firatê û kiştukalî û çandiniya wê navçeyê.

Deverên Rohhilatê Parêzgeha Dêrezorê, di sala 2019'an de, ji dest rêxistina terorîst ya DAIŞê bi alîkariya hêzên HSD û koalisyona Navneteweyî ya li dijî terorê bi rêberiya Amerîka hatin rizgar kirin, lê bi carekî ev dever ji çeteyên DAIŞê nehatin paqijkirin û car car ji aliyê grûpên veşartî yên DAIŞê êriş li dijî HSD dihatin pêkanîn, tevî ku hejmarên mezin ji van çeteyên terorîst ji girtîgehên Rêveberiya Xweser bi piştgiriya eşîrên Ereban dihatin berdan û gelek ji wan tevî hêzên parastinê yên Rêveberiya Xweser bûn, ku heta îro jî tatkiliyên hin serok eşîrên ereb yên Dêrezorê û Hesekê bi aliyên cuda re hene, bi taybetî ligel Îranê û Tirkiyê û rejîma Şamê.

Lewra wekî dîtina gelek çavdêr û şirovekarên siyasî, ku bi çira kesek ya hêzên Amerîka, serokê Encûmena Leşkerî ya Dêrezorê (Ebû Xwela) hatiye girtin û tevî paqijkirina Encûmena navhatî ji serkirdeyên wê yên tatkilî û danûstandin digel rêxistina DAIŞê û milîsên Îranê hene, ne wek nûçeyên media Erebi ya nijadperistî ku hewl didin van oparsyonên leşkerî li Dêrezorê bêxin di çarçoveya şerekî neteweyî de, wek bi Şerê Kurd û Ereban binav dikin.

Her wekî em dibînin, ku tatkiliya van oparsyonên îro li Dêrezorê bi şerekî veşartî di navbera Amerîka û Îranê de heye, ku Îran û Rûsiya bi awayekî aşkere û Tirkiya bi awayekî veşartî hewla dersînorkirina hêzên Amerîka ji Rohhilatê Sûriyê didin, ku gelek caran ev yek di civînên Astana û civînê dûqolî û sêqolî di navbera Tirkiya-Rûsiya-Îranê de hatiye dîpat kirin, lewra dikarin bêjin ku ti tatkiliya oparsyonên niha yên li Dêrezorê bi Kurd û Ereban nîne, zêdebarî ku îro pitirîya şervanên HSD yên niha li Dêrezorê ji eşîrên Ereban pêk tê, lê ji aliyê hin eşîrên Ereban ve, bi taybetî ew serok eşîrên girêdayî Îranê, Tirkiyê û paşmayên DAIŞê û tevî opozîsyona Sûriyê hewl didin ku van oparsyonên leşkerî li Dêrezorê wekî şerekî Kurdî-Erebî binav bikin û gefan li Gelê Kurd dixwin, tevî ku hemû partiyên kurdî yên girêdayî PYD û ENKSê tekezî li ser pêkvejiyanê di navbera kurd, Ereb û Siryanan de dikin.



Dibe ku ev oparsyon bo çend rojên din dirêj bike, lê dijminatî û nijadperistîya Erebi li dijî Gelê Kurd, dê bo demekî dirêj berdewam bike, ev dijminatîya ku bi dehên salan ji aliyê dewletên dagîrker bi taybetî li Sûriyê ku ji aliyê partiya Be'is ya deshilatdar û niha ji aliyê DAIŞê û opozîsyona Sûriyê ve tê xudankirin, ku divê Gelê Kurd hişyar be li hember gef û metirsiya nijadperistîya Erebi û bi awayekî praktîk divê kar bike bo misogerkirina mafên neteweyî yê Gelê Kurd û divê Partiyên Kurdan dest berdin ji dirûşmên bê wate wekî yên niha tene pêşniyarkirin, di pêşiyê de divê kar bike bo rêxistina navmala kurdî û peydakirina zemîna tifaq û yekrêziyê.

